

Kaxiz helwesta

Asankirina destûra niştecihbûnê ya daîmî û hemwelatîbûnê ji bo mirovên kêmendamiyê



NOW! Ne bêyî Me

Di derbarê me de

„NOW! Ne bêyî Me“ piştgirêdana bi xwe ya penaberên kêmendamiyê e. Em bi xwe penaber in û kêmendamiya me heye. Ji dema hatina me ya Almaniyayê ve em rastî astengiyên tî. Lê em di koma xwe de têgihîştin û hevgerîna dibînin. Em hevûdu xurt dikin û bi hev re ji bo civakek berfireh dixebitin.

Em tiştekî dikin ku penaberên kêmendamiyê û malbatên wan li Almaniyayê bikaribin baştir bijîn.

Penaberên kêmandam û endamên malbatên wan dema ku hewl didin destûra niştecihbûnê ya daîmî an hemwelatîbûnê bistînin, rastî pirsgirêkên mezin tên. Sedema vê jî ew e ku rastiya jiyana kesên kêmandam û endamên malbatên wan di rewşa hiqûqî ya heyî de têra xwe nayê nîşandan. Astengiyên li pêşiya gihîştina bazara kar a yekem û hewldanên mezin ên xizmên wan ên lînêrer ji bo peydakirina debara jiyane û fêrbûna ziman pir hindik tene hesibandin. Îstîsnayên ku ji bo kesên kêmandam û endamên malbatên wan hatine diyarkirin, vê rastiye têra xwe nîşan nadin.

Sedem:

Ji bo destûra niştecihbûnê ya daîmî an hemwelatîbûnê pêdivî ye ku şertên bingehîn pêk werin. Ev jî di serî de ewlekirina debara jiyane di nav çend salan de û delîlên fêrbûna zimanê bi şeweyeke serkeftî digire nava xwe.

Ji bo penaberên kêmandam zehmet e ku di bazara kar a seretayî de karekî bi dest bixin û garantiya debara jiyane ya bêkêmasî bikin. Gelek kesên kêmandam di atolyeyan de dixebitin. Xebata ku li wir tê kirin, di warê dabînkirina debara ji bo hemwelatîbûnê an jî destûra niştecihbûnê ya daîmî nayê naskirin.

Endamên malbatê ên lînêrer ne xwediyê kapasîteya ku tev-demjimêr bixebitin, ev tê vê wateyê ku ew pir caran nikanin debara xwe bikin. Lînêrîna endamên malbatên wan pir caran pir bi daxwaz e û gelek enerjî û wext hewce dike.

Fêrbûna ziman ji bo gelek penaberên kêmandam bi astengên mezin re têkildar e. Kursên Almanî bi gelemperî têra xwe bê asteng nînin. Gelek dibistanên koran ji bo kesên xwedî paşxaneyê koçberiyê têra xwe ne minasîb in. Kursên entegrasyonê ji bo kesên kor pir hindik in. Endamên malbatê ên ku karê lînêrînê dikin, gelek caran wextê wan tune ku beşdarî kursên almanî bibin.

Qanûnên heyî yê li ser hemwelatîbûnê (§10 ji Qanûna Hemwelatîbûnê-StAG) û destûra niştecihbûnê ya daîmî (§9 ji Qanûna Niştecihbûnê-AufenthG) bi têra xwe rewşa taybetî ya penaberên kêmandam nagirin berçavan. Îstîsnayên heyî kêmandam:

Di derbarê dabînkirina debara jiyane de, di rewşa hemwelatîbûnê de tê gotin ku „*Sûdwergirtin ji xizmetan li gorî Qanûna Civakî ya Duyemîn an Dozdehemîn*“ bê zirar e heke serlêder „*ji sûdwergirtin ji wan ne berpirsiyar be*“ (§10 Paragraf 1 Hevok 1 StAG). Îstîsnayên ji bo kesên kêmandam jî di warê fêrbûna zimanê de wusa tene diyarkirin: Şertên ji bo fêrbûna ziman „*heke biyanî ji ber nexweşiyek laşî, derûnî an rûhî an seqetiyek nikaribe wan bi cih bîne, tene rakirin.*“ (§10, Paragraf 6 StAG). Rewşa dijwar a endamên malbatê ên ku karê lînêrînê dikin, di qanûna hemwelatîbûnê de tew nayê behskirin. Di rêzîknameyên li ser destûra niştecihbûnê ya daîmî de, îstîsna tenê di derbarê tevkariyên ji bo sîgortaya teqawîtbûnê ya qanûnî de hatine binavkirin: „*Demên bêkariyê ji ber lînêrîna zarokan an lînêrîna malê dê li gorî wê were hesibandin*“ §9 Paragraf 2 AufenthG.

Mixabin, îstîsnayên ku tene diyarkirin, bi gelemperî di pratîkê de naxebitin. Saziyên koçberiyê bi gelemperî ji rewşa tenduristiya serlêderan û kapasîteya dahata wan a teorîkî dest pê dikin. Ew di vê yekê de astengên ji bo gihîştina bazara kar nabînin.

Encam:

Ji ber vê yekê jiyana rojane ya penaberên kêmandam û malbatên wan bi nezelaliyek domdar û girêdayîbûna bi mafê mayînê ve tê diyarkirin. Tirsaxizaniyê di pîrbûnê de jî pir rast e. Ji ber ku her çiqas gelek kesan hemû jiyana xwe li welatên xwe kar kirine, lê li Almanyayê mafê wan ê teqawidbûnê nîne.

Pêdivî ye ku çî biguhere?

Dema ku dor tê ser pirsên destûra niştecihbûnê ya daîmî û hemwelatîbûnê, em pabendbûnek eşkere ji hebûna penaberên kêmendamiyê re û naskirina xebata pir caran gelek dijwar ya endamên malbatê ên lînêrer dixwazin.

1. Divê endamên malbatê ên lînêrer ji ewlekariya debara jiyane û şertên fêrbûna zimanê werin îstîsnakirin. Divê lînêrên wekî karekî girîng were naskirin.
2. Di rewşa hemwelatîbûnê û destûra niştecihbûnê ya daîmî de, kesên kêmendamiyê divê ji bicihanîna şertên dabînkirina debara jiyane werin îstîsnakirin.

Di dema biryardanê de li ser bikaranîna îstîsnayên têkildar ên kêmendamiyê, divê xala destpêkê ne rewşa tenduristiya serlêder, lê belê astengên rastîn ên gihîştina bazara kar be.

Têkilî:
Rezan Shekh Muslim
rezansalihibo@hotmail.com